giregir û rûspiyan civakê dibin bi gelemperî amûran bi kar naynin, ew li çend herêman li ber amûrên her wekî saz, tenbûr, kemaçe û kema kilam û stranên jî dibêjin. Bo nimûne, ku *Dengbêj Reso* (1902–1983) û *Dengbêj Şakiro* (1936–1996) hunera xwe bêyî amûran pêşkêş dikirin, *Miradê Kinê* (1943–1984) kilamên dilan û destan li ber kemaçeyê digot û *Adîk* (1907–2007) kilamên dilan û destan li ber tenbûra xwe digot.

Piştî ku Komara Tirkan hat damezirandin, zimanê kurdî hat qedexekirin û gelek salan duçarî şeweyên curecure yên pest û pêkutiyê bû. Li gel van qedexeyan, dengbêjan li bara parastina zimanê kurdî roleke ciyê pêşengiyê gerra. Di salên 1960î de, teknîkên tomarkirina dengên ev çanda zardevkî lap guherand.

Dengbêjên ku bi kevneşopî bi xêra peywendiyêke hosta-şagird hîn bûbûn û bi riya çavkaniyên berteng fêrî destanên binê zemanan dibûn ev geşedana teknolojîk bi kar anîn da ku xwe bigihînine komên guhdaran ên firehtir. Bi taybetî, belavkirina bi hezaran kasêten ku wan bi amatorî tomar kirin delîlê bo wan dabîn kir ku ber li komên xwe yên guhdaran fireh bikin. Bi awayekî ji awayan, vê yekê bîra wan a civakî û hunerî tomar kir. *Dengbêjên* ku her wiha qewamên polîtîk û mêjûyî yên giring, afat û bobelat, evîn, tebî'et, koçrevî, hesret û rapêrînên kurdan vedigêrran roleke navendî gêrran li bara vejîyandina berdewam û parastina vê bîra civakî.

Heta bi nîveka sedsala bihurî, hejmara kesên profesyonel û nîv-profesyonel ên bi vê hunerê re rabûyî bi têra xwe hebûn. Îro, hejmara dengbêjên çalak kêma bûye, lê keleporekê jî maye û *dengbêj* hîn jî dibêjin. Weke gotin li gotinê ketiye, Mala *Dengbêjan* a bi piştevaniya birêveberiyên herêmî li hin bajaran hatine avakirin û bernameyên taybet ên di festîvalên curecure de û li ser kanalên televizyonê jî wan re terxan kirî piştvanîyê didine hunera dengbêjan. Van dehsalên dawiyê, van platforman hişt ku rayeke giştî ya navneteweyî ya berfirehtir çanda dengbêjiyê binase. 'Evdalê Zeynikê, yê bi navê xwe di civaka kurd de bûye efsane, bi çîrokên xwe yên ta bi roja îro mayî ve di vê keleporekê de yek ji navdartirîn nav e. Ku *Dengbêj Şakiro*, yê xelqê devera Serhedê, bi dengê xwe yê bi qas û qudret û repertîwara xwe ya berfireh ve di dilên gelek guhdarên dengbêjan de hêlîna xwe vedayeç *Miradê Kinê* bi pêş de tê weke hunermendekî muhim ê dîtir ê ku bi xurtî tesîr li mosîqajenên ciwan ên li Mêrdînê û li dewr û berê wê kiriye. Îro, çanda dengbêjiyê yan jî dengbêj bi xwe bûne semboleke neteweyî ya ku ji aliyê bizavên polîtîk ên kurdan û hunermendên kurd ve ji nû ve tê berhevanîn û ji nû ve tê sazîkirin. Her wiha, ew pê berdewam in pişkdariyê li parastin û geşûgurrkirina zimanê kurdî dikin.

Ömer Delikaya

Dr. Bingöl Universität, Kurdische Sprache und Literatur/
Dr. Zankoya Çewligê, Ziman û Wêjeya Kurdî

Donnerstag Pêncşem

Betrachtungen des Völkermords an den Ezid:innen aus der Diaspora/ Nêrîneke ji Diyasporayê li ser Komkujiya Êzîdiyan

● 18:00 Uhr

»Stimmen der Flucht und Ankunft«

Moderatorin/Pêşkêşvan: Katharina Brizić

Sprache/Ziman: Deutsch/Elmanî

Ort/Ci: Großer Saal

Düzen Tekkal



Düzen Tekkal ist Journalistin, Kriegsberichterstatteerin, Bestseller-Autorin, Dokumentarfilmemacherin, Sozialunternehmerin und die Tochter nach Deutschland geflohener Ezid:innen. Nach dem Völkermord an den Ezid:innen durch den IS im Jahr 2014 wurde sie zur Menschenrechtsaktivistin und gründete die Menschenrechtsorganisation HÁWAR.help. Im Jahr 2021 gründete sie die bundesweit tätige, parteiübergreifende Bildungsbewegung

GermanDream. Für ihr Engagement wurde sie mehrfach ausgezeichnet – unter anderem mit dem Bundesverdienstkreuz.

Düzen Tekkal rojnamevan, peyaminêra şer, nivîskara bestseller, belgefilmçêker, destpêşxera civakî û keça malbateke êzdî ya koçber e. Piştî komkûjiya sala 2014an a li hemberî êzîdîyan, wê berê xwe daye aktivîstiya mafên mirovan û Komeleya Mafên Mirovan HÁWAR.help damezirandiyê. Di sala 2021ê de, wê tevgera perwerdehiyê ya bi navê GermanDream a li seranserê Elmanyayê damezirand, ku ev tevger ne parçeyê partiyeke siyasî lê di ser partiyan re ye. Ji ber kar û xebatên xwe, heta niha wê gelek xelat wergirtine. Xaça Federal a Şayesteyiyê (Bundesverdienstkreuz) yek ji wan e.

Ronya Othmann



Ronya Othmann, als Tochter einer deutschen Mutter und eines kurdisch-ezidischen Vaters 1993 in München geboren, schreibt Lyrik, Prosa und Essays und arbeitet als Journalistin. Für »Die Sommer«, ihren ersten Roman, bekam sie 2020 den Mara-Cassens-Preis zugesprochen, für den Lyrikband »die verbrechen« (2021) den Orphil-Debütpreis, den Förderpreis des Horst-Bienek-Preises sowie den Horst Bingel-Preis

2022. Ein Auszug aus »Vierundsiebzig«, ihrem zweiten Roman, wurde 2019 mit dem Publikumspreis des Ingeborg-Bachmann-Preises ausgezeichnet. Ronya Othmann, keça dayikeke elman û bavekî kurd-êzîdî, di sala 1993yan de li Münchenê ji dayik bûye. Ew helbest û peşxanan dinivîse û rojnamevaniyê dike. Ji bo romana xwe ya yekem a bi navê *Die Sommer* (Havîn) di sala 2020an de Xelata Mara-Cassensê wergirt û her wiha bi kitêba xwe ya helbestan a bi navê *die verbrechen* (Tawanekan, 2021) Xelata Orphil-Debütpreisê û Xelata Piştgiriya ya Horst Bienek û her wiha Xelata Horst Bingel a sala 2022yan wergirt. Parçeyek ji romana wê ya duyem a bi navê *Vierundsiebzig* (Heftê û Çar) di Pêşbirka Ingeborg Bachmannê ya sala 2019an de Xelata taybet ya Temaşevanan wergirt.

Dr. Leyla Ferman



Dr. Leyla Ferman ist als Kind kurdisch-ezidischer Eltern in Niedersachsen geboren und aufgewachsen. Nach Abschluss einer Ausbildung zur Bankkauffrau studierte sie an der Leibniz Universität Politische Wissenschaft, BWL und Rechtswissenschaften. Ihre Promotion zu »Dezentralisierung und ethnische Konflikte. Kurdenfrage und lokale Ebene in der Türkei« beendete Leyla Ferman 2014. Als Vorstandsmitglied des Vereins Women

for Justice engagiert sie sich für die Dokumentation und rechtliche, gesellschaftliche und politische Aufarbeitung des Genozids an den Ezid:innen und unterstützt ezidische Überlebende und Wiederaufbauprojekte in Sinjar/Irak. Dr. Ferman weke zaroka malbateke kurd-êzdî li Niedersachsenê hatiye dinê û mezin bûye. Piştî ku perwerdeya karmendiya banqeyê qedand, li Zanîbgeha Leibnizê zanîsta politîk, rêvebiriya pargîdaniyê û hiqûq xwend. Xebata xwe ya doktorayê di sala 2014an de li ser »Navendîkirin û Pevçûnên Etnikî: Kêşeya Kurdan li Tirkiyê« çê kir. Weke endama Komeleya Jin ji bo Edaletê bi taybetî ji bona tespît û qeydkirina delîlên komkûjiya li hemberî êzîdîyan, karîgeriya hiqûqî, civakî û politîk ya van delîlan dixebite, piştgiriya saxiyên komkûjiyê dike, ji bona vesazkirina Şengalê dixebite.

↔ Katharina Brizić

Katharina Brizić



Katharina Brizić ist Professorin für Mehrsprachigkeit an der Universität Freiburg. Für ihre Arbeit erhielt sie diverse Auszeichnungen (z.B. das Mercator-Fellowship). Sie ist seit 2018 wissenschaftliche Beraterin des Humanitären Aufnahmeprogramms Brandenburg für ezidische Menschen aus dem Nordirak, und hat auch das Projekt FERMAN als Beiratsmitglied intensiv begleitet. Katharina Brizić di Zanîngeha Freiburgê de profesora pir-zimanîyê

ye. Heya niha ji bo karê xwe yî serkeftî gelek xelat wergirtine (bo nimûne, Piştgirîya Mercatorê ji bo Kesayetên Girîng di Cihana Zanîstê de). Ji sala 2018an pê ve Katharina Brizić şewirmenda zanistî ya Projeya Piştgirîya Mirovî ya Brandenburgê ya ji bo êzidiyên Bakûrê Iraqê dixebite. Herweha di projeya FERMAN de jî (Leyla Ferman serokatiya vê projeyê dike).

● 19:30 Uhr

»Widerständige Zeugenschaft – Über den Genozid sprechen«

Moderatorin/Pêşkêşvan: Ferda Berse

Sprache/Ziman: Deutsch/Elmanî

Ort/Ci: Großer Saal

Farhad Alsilo



Farhad Alsilo wurde 2002 im Nordirak in der Stadt Shingal geboren. Der damals 11-jährige Junge erlebte und überlebte den Genozid des IS. Er flüchtete mit seiner Mutter und den Geschwistern nach Deutschland, wo er schnell die deutsche Sprache lernte. Farhad besucht derzeit ein Technisches Gymnasium. Er ist auf YouTube und Instagram aktiv. Außerdem ist er bei einer Menschenrechtsorganisation als Botschafter

tätig und hat seine Lebensgeschichte als Buch veröffentlicht.

Farhad Alsilo di sala 2002an de li Şengalê hate dinê. Weke lawikekî 11 salî komkûjîya Daîşê bi çavên serê xwe dît û jê filitî. Dîgel dayik û xwişk-birayên xwe hate Almanyayê û di demeke kurt de zimanê Elmanî fêr bû. Farhad aniha xwendekarê lîseya teknîk e. Ew li ser Youtube û Instagramê çalak e. Herweha weke peyamnerê komeleyeke mafên mirovan dixebite û serpehatiya jiyana wî weke pirtûk hatiye çapkirin.

Jihan Alomar



Jihan Alomar ist eine Überlebende des IS-Terrors. Ihr Buch »Dankbarkeit. Die schlimmste Zeit meines Lebens« (2021) ist eine Niederschrift ihrer eigenen Erlebnisse mit dem Terror. Sie besucht mit ihrer Geschichte Schulen und klärt dort Jugendliche über das Ezidentum auf. Sie ist Menschenrechtsaktivistin und Botschafterin bei HÁWAR.help.

Jihan Alomar saxmayîyeke komkûjîya Daîşê ye. Wê serpehatiya xwe ya şexsî ya bi terrora Daîşê weke pirtûk nivîsandiye. Ew serdana dibistanan dike û bi çîroka xwe perwerdeyê derbarê êzdiyatîyê de dide. Jihan aktîvîsta mafên mirovan û peyamnera HawarHelpê ye.

Ferda Berse



Ferda Berse ist Sozialwissenschaftlerin und arbeitet als Gewerkschaftssekretärin und Politische Bildnerin. Sie ist in Celle in der weltweit größten ezidischen Diasporagemeinde aufgewachsen und engagiert sich seit zehn Jahren in verschiedenen gesellschaftspolitischen Organisationen zu den Themen Islamismus, Kurdistan und ezidisch Diaspora in Deutschland.

Derzeit schreibt und referiert sie zu Verschwörungsmymen und Feindbilder über Eziden sowie zu sexualisierter Gewalt in Kriegen. Ferda Berse zanyara civakî ye û weke sekretera sendîkayê perwerdekara siyasetê dixebite. Ew li bajarê Celle ya li Saksonyaya jêrîn, di nav civaka êzîdî ya mezintirîn ya li dîasporayê de mezin bûye û heya niha tevkarîya gelek tevgerên civakî-polîtîk kiriye. Bi awayeke teorîk û pratîk bi mijarên weke îslamîtî, kurdistan û dîasporaya êzîdîyan ve mijûl bûye. Aniha ew di derbarê teoriyên komployê, dijminatîyên li hemberî êzîdîyan û tûndîya zayendî de nivîsan dinivîse.

● 21:00 Uhr

»Haus ohne Dach« Filmvorführung, anschließend Q&A mit Regisseurin Soleen Yusef

Moderatorin/Pêşkêşvan: Beliban zu Stolberg

Sprache/Ziman: Deutsch/Elmanî

Ort/Cî: Großer Saal

Soleen Yusef



Soleen Yusef wurde 1987 in Duhok, im kurdischen Teil des Irak, geboren. Im Alter von neun Jahren flüchtete sie mit ihrer Familie aus politischen Gründen nach Deutschland. Ab 2008 studierte sie an der Filmakademie Baden-Württemberg szenische Regie. »Haus Ohne Dach« ist zugleich ihr Debüt als auch Diplomfilm. Seitdem war Soleen Yusef unter anderem für Netflix und Amazon Prime als Regisseurin tätig. Für Disney+ drehte sie

2022 die Miniserie »SAM – Ein Sachse« 2024 kommt »Sieger Sein«, ein Kinderfilm der von DCM Pictures produziert wird, in die Kinos.

Soleen Yusef di sala 1987an de li Duhokê, başûrê Kurdistanê hate dinê. Dema ku ew neh salî bû, ji ber sedemên politik malbata wê koçî Elmanyayê kir. Ji sala 2008an ve li Akademiya Filmê Baden-Württemberg perwerdeya derhêneriya dîmenê girt. Haus Ohne Dach (Xaniyê Bêban) filmê wê yê yekem û xelaskirina perwerdê bû. Ji wê demê heya niha Soleen Yusef digel gelek projeyên din ji bo Netflix û Amazon Primeê weke derhêner dixebite. Ji bona Disney+ê wê derhêneriya rêzefilmekî kurt bi navê SAM – Ein Sachse kiriye. Di 2024an de DCM Pictures filmê wê yê bi navê Sieger Sein da çêkirin û ev film niha li sînameyê ye.

Beliban zu Stolberg



Beliban zu Stolberg ist Drehbuch- und Prosautorin. Sie studierte an der Deutschen Film- und Fernsehakademie Berlin im Gewerk Drehbuch. Sie arbeitete fürs Kino, für die öffentlichen Sender sowie für Netflix. 2023 nahm sie an der Netflix Writing Academy teil. Sie erhielt u.a. das Robert-Bosch Grenzgänger Stipendium 2018 und die Schreibresidenz im Museumsquartier Wien 2024. 2023 erschien ihr Debütroman

»Zweistromland« im Kanon Verlag.

Beliban zu Stolberg nivîskara senaryo û pexşanê ye. Wê perwerdeya nivîskariya senaryoyê li Fernsehakademie Berlinê girtiye. Ji bona Netflix û her wiha filmçêkerên serbixwe xebitiye. Di 2023yan de di Akademiya Nivîskariyê ya Netflixê de cih girtiye. Digel gelek xelatên din, piştgiriya nivîskariyê »Robert-Bosch Grenzgänger Stipendium ya sala 2018an wergirtiye û herweha piştgiriya nivîskariyê ji Museumsquartier Wienê ji bo sala 2024an wergirtiye. Di 2023an de romana wê ya yekem »Zweistromland« ji Kanon Verlagê der çûye.

Die Ezid:innen und das Ezidentum

Êzdî û Ezdiyatî

[...] dreimal am Tag wenden sie sich an die Sonne und beten. Ihre Gebete sind nicht wie unsere, einstudiert. Jeder der will, mag er Kind, jung oder alt, Emir oder Scheich sein, stellt sich vor die Sonne und erzählt ihr das, was in diesem Augenblick sein Herz spricht. Vielleicht sind dies die schönsten Gebete, die die Menschheit je hervorgebracht hat. Vielleicht entspringen die schönsten Lieder, die schönsten Dichtungen diesen Gebeten. Vielleicht wurzeln alle Legenden und Sagen Mesopotamiens in diesen Gebeten.

Yaşar Kemal, Die Ameiseninsel

[...] rojê sê caran berê xwe didine rojê û nimêj dikin. Nimêjên xwe weke ên me naxwînin. Her kes, çî zarok be, çî ciwan yan jî pîr, çî jî mîr yan jî şêx, heçî ku bixwaze, li ber rojê disekine û ji rojê re dibêje heçî tiştê ku wê kêliyê dilê wan dibêje. Dibe ku ev bedewtirîn nimêj bin ku mirovayiyê ta niha çêkirine. Dibe ku bedewtirîn stran bin, bedewtirîn helbest ku ji van nimêj derketibin. Dibe ku koka efsane û destanên Mezopotamyayê hemûyan ev nimêj bin.

Yaşar Kemal, Dorgeya Gêrikan

● Ezid:innen sind eine kurdischsprachige (Kurmanci) Gemeinschaft. Ihr Glaube ist über 4.000 Jahre alt. Ezid:innen sind Dualist:innen und glauben einerseits an einen Schöpfergott und andererseits an den Pfauenengel Tawisî Melek, das ausführende Organ des göttlichen Willens. Radikale und auch viele gemäßigte Muslime betrachten Ezid:innen aufgrund einer Fehlinterpretation der Pfauenengel-Figur als »Anbeter des Bösen«. Obwohl viele Ezid:innen kurdisch sprechen und sich die Mehrheit von ihnen als der kurdischen Ethnie zugehörig versteht, unterscheiden sie sich auf Grund ihres Glaubens von der überwiegend sunnitischen kurdischen Bevölkerung. Vor dem Angriff des IS im Jahr 2014 lebten etwa 700.000 Ezid:innen (Stand 2005) vor allem im Bezirk Şengal (arab. Sinjar) im Nordirak. Seitdem ist ihre Zahl dort unter 500.000 gesunken.

Das Ezidentum (kurd. Êzdiyatî) ist ein vor der aktuellen Zeitrechnung entstandener Glaube. Er ist sehr naturverbunden (Natur = kurd. Xweza), vor allem die Sonne nimmt einen hohen Stellenwert ein. In dem Glauben gibt es nur einen Gott/eine Gottheit (kurd. Xwedê/Xweda). Vertreter Xwedês auf Erden – Mittler zwischen Xwedê und den Ezid:innen – ist der Obererzengel Tawisî Melek (Engel Pfau / Gottes Engel). Die Entstehungsregion des Glaubens ist Mesopotamien, das Zweistrom-Gebiet um Firat (dt. Euphrat) und Dicle (dt. Tigris).

Die Bezeichnung der Mitglieder der Glaubensgemeinschaft ist auf Kurdisch Êzdî/Êzîdî bzw. Ezda; es ist einer der vielen Namen Gottes/der Gottheit. Xweda/Xwedê ist »der, der sich selbst erschaffen hat«. Und Êzdî/Êzîdî bzw. Ezda heißt übersetzt »der, der mich erschaffen hat« (Ez–da).[1] Das Wort Êzdî/Êzîdî heißt somit »die Anhänger Gottes / der Gottheit«. Das führt darauf zurück, dass Gott / die Gottheit alles und jedes und auch sich selbst erschaffen hat.

Ethik des Ezidentums

Gott erschafft aus seinem Licht die Erde. Das hat zur Konsequenz, dass jedes Lebewesen einen Anteil des göttlichen Lichtes (nûr) in sich trägt. Dieses göttliche Licht kann aber nur durch Vernunft (aqil) entfaltet werden. Jedes Individuum trägt die Anlagen sowohl für das Gute als auch für das Böse in sich.

Das Menschenbild der Ezid:innen ist davon bestimmt, dass der Mensch für sein Wirken und Handeln selbst verantwortlich ist. Er hat von Gott die Gabe des Hörens, Sehens und Denkens erhalten. Mit diesen Anlagen hat er die Möglichkeit, den richtigen Pfad zu beschreiten. Unter den Ezid:innen gilt die Auffassung, dass ein:e Ezid:in ein guter Mensch sein soll, aber um ein guter Mensch zu sein, muss er nicht Ezid:in sein. Das Ezidentum hat keinen Absolutheitsanspruch – es gibt nicht nur »eine Wahrheit«, sondern »viele Wahrheiten«. Ein Beispiel aus dem Alltag für dieses Denken ist der Wunsch »Gott, schütze die 72 Völker und auch uns.« Die 72 Völker stehen für alle Glaubensgemeinschaften und Bevölkerungsgruppen.

Drei besonders wichtige Gebote und Tugenden sind rastî (Wahrheit/Gerechtigkeit), şermî (Schamgefühl) und nasîn (Kenntnis/Wissen). Rastî erfordert Aufrichtigkeit, immer ehrlich und gerecht zu sein. Şermî ist das Gebot des Respekts anderen gegenüber oder andersherum die Scham oder Sorge, jemanden nicht richtig zu behandeln, jemandem nicht angemessen und respektvoll gegenüberzutreten. Und nasîn ist die Mahnung, nach Wissen zu streben, um klug handeln zu können; denn Unwissenheit und Dummheit führen zu Fehlern, so dass anderen geschadet werden könnte.

Weitere wichtige Prinzipien werden im Wesen des ezidischen Obererzengels Tawisî Melek repräsentiert, das sind vor allem Mut und der Einsatz des eigenen Verstandes. Dazu gehört, das zu tun, was man selbst für richtig hält, die Konsequenzen aus dem eigenen Tun selbst zu tragen, sich eine eigene Meinung zu bilden, manchmal gegen den Strom zu schwimmen und Befehlen nicht blind zu folgen, selbstbewusstes Auftreten, stets kritisch zu bleiben und Dinge zu hinterfragen, Mitmenschen ein Vorbild zu sein und niemanden zu verurteilen.

● Êzdî civakeke Kurdîaxêv (Kurmancîaxêv) e. Baweriya wan a ayîni bêtirî 4,000 salan kevn e. Êzdî dualîst in û ji aliyekî ve baweriya xwe bi Xwedayê afirîner, ji aliyekî din ve jî baweriya xwe bi Tawisê Melek ê serperîştê vîna xwedayî tînin. Ji ber şiroveyeke şaş a di derbarê Tawisê Melek de, tundrew û herwiha gelek misilmanên nerm êzîdiyan weke »perestkerên xerabiyê« dibînin. Tevî ku gelek êzdî bi kurdî dipeyivin û piraniya wan xwe ji nijada kurdan dibînin, ji aliyê baweriyê ve, gelek cudahî di navbera wan û kurdên sunî de hene. Beriya êrîşa DAÎŞê di 2014an de, dora 700,000 Êzdî (ji amarên 2005an) bi pirranî li navçeya Şingalê (Sincar bi erebî) li bakurê Iraqê dijîyan. Ji hingê ve hejmara wan daketiye binê 500,000î.

Êzdiyatî baweriyek e ku berî zayîne çêbûye. Beriya her tiştî, êzdiyatî gelekî girêdayî xwezayê ye, bi taybetî roj tê de gelekî girîng e. Di vê baweriyê de tenê Xwedayek/xwedabûnek heye. Nûnerê Xwedê yê li ser rûyê Erdê – navberkarê Xwedê û êzdiyan – serekmelek Tawisî Melek e. Herêma çêbûna vê baweriyê Mezopotamya ye. Mezopotamya derdora çemên Firat û Dicleyê ye.

Navê endamên vê civaka ayîni bi kurdî êzdî/êzîdî yan jî ezda ye; ev nav yek ji gelek navên Xwedê/xwedabûnê ye. Xweda/Xwedê »ê ku xwe afirandiyê«. Û wateya êzdî/êzîdî yan jî ezda »ê ku ez afirandine«. [1] Lewma peyva êzdî/êzîdî tê wateya »alîgirên Xwedê/xwedabûnê.« Esasê di vir de vedigere ser wê yekê ku Xwedê/xwedabûn her tişt û her kes û xwe jî afirandine.

Sinca Êzdiyatîyê

Xweda cîhanê ji ronahiya xwe diafirîne. Encama vê yekê jî ew e ku her zindiyek beşek ji ronahiya xwedayî (nûr) di nava xwe de dihewîne. Lê ev ronahiya xwedayî tenê bi riya hiş dikare pêş bikeve. Di her kesî de hem qencî hem jî xerabî heye. Bi dîtina êzîdiyan mirov ji kirinên xwe berpirsyar e. Wî/wê ji Xwedê/xweda diyariyên weke bihîstin, dîtin û ramanê wergirtiye. Bi van taybetmendiyan derfeta wî/wê heye ku rêya rast bişopîne. Êzdî bawer dikin ku êzdiyek dikare bibe kesekî baş, lê belê ji bo ku yek bibe kesekî baş, pêwîstî tune ye ku ew bi xwe êzdî be. Di êzdiyatîyê de îdiaya mutleqiyetê tune ne– ne tenê »rastiyek heye«, »gelek rastî« hene. Nimûneyek ji jiyana rojane ya vî şûweyê hizirîne ew daxwaz e ku dibêje, »Xwedê, 72 miletan û me jî biparêze.« 72 milet ji bo hemû civakên olî û komên miletan e.

Sê qaîde û taybetiyên sûdmend ên giring 'rastî' (rasteqîn/dadperwerî), 'şermî' (hesta şermê) û 'nasîn' (zanîn) in. Rastî dilpakiyê dixwaze, her tim rast û dadmend be. Şermî qaîdeya hurmeta kesên din e an jî berovajî vê, şerm an xema ku mirov bi kesekî re ne rast be, bi yekî re bi rêz tevnegere. Û nasîn şîret xwestina zanîne ye, da ku mirov bi awayekî hişmend tevbigere; ji ber ku nezani û bêaqilî dibin sedema şaşiyên ku dikarin ziyane bidine kesên din.

Rêgezên giring ên din di cewherê Tawisê Melek ê sermelekê êzdiyan de cih digirin, beriya her tiştî gernasî û bikaranîna hiş in. Tê de kirina tiştê ku hûn rast dibînin, hilgirtina encamên kirinên xwe, çêkirina nêrineke xwe, carinan li dijî fermanan be û bi awayekî kor qaîdeyan naşopînin, xwebawer û hertim rexnegir bimînin û tiştan bipirsîn, da ku hûn ji mirovan bibin mînak û tu kesî dadbar nekin.

[1] Ezda peyva binçîneyî ye ku îro ro bi wateya xwe ya lefzî lap kevn e û bi tenê di binavkirina Êzdiyan de rolekê digêrre. Bo wateya »Ew ê ez afirandî« îro ro bi zimanê rojane »Min-da /Ez-da'm« tê bikaranîn.

Yilmaz Pêşkevin Kaba

Ezidischer Friedens- und Freiheitsaktivist und Fernsehmoderator von Çira TV/Aktivistekî aştiyê û azadiyê yê êzdî ye û pêşkêşvanê televizyona Çira TVyê ye.

Exil, Erinnerung und Geschlecht/ Sirgûn, Bîr û Zayend

● 18:00 Uhr

»Bîra Malê û Bêriya Malê« »Erinnerung an Zuhause, Nostalgie nach Zuhause«

Moderator / Pêşkêşvan: Matthias Hoffmann

Sprache / Ziman: Kurdisch und Deutsch / Kurdî û Elmanî

Dolmetscher:innen / Wergêr: Sozdar Jafarzadeh und Flê Mereto

Ort / Cî: Großer Saal

Yildiz Çakar



Yildiz Çakar, geboren 1978 (Diyarbakir), ist Dichterin und Schriftstellerin. Neben ihrer Tätigkeit als Korrespondentin und Redakteurin für kurdische Zeitungen sind ihre Gedichte in zwei Bänden erschienen: »Friedhof der Sterne« (2004) und »Die Tür« (2012). Außerdem hat sie eine Enzyklopädie, mehrere Romane und eine Kurzgeschichtensammlung veröffentlicht und ist Gründungsmitglied des Kurdischen Schriftstellerverbands.

Yildiz Çakar di 1978an de li Amedê ji dayîk bûye, helbestvan û nivîskar e. Ji bilî karê peyamnêrî û edîtorîyê di rojnameyên kurdî de, helbestên wê di du cildan de derketine »Goristana Stêrkan« (2004) û »Derî« (2012). Weke din jî wê ensiklopediyek û gelek roman û kurteçîrok weşandine. Endama avakar ya Komeleya Yekitiya Nivîskarên Kurd e.

Hesen Ildiz



Hesen Ildiz ist 1991 in einem kurdischen Dorf in der Türkei geboren. Er studierte Medizin in Istanbul und Budapest. Sein erster Kurzgeschichtenband »Tîrspîvan« (Kurdisch für »Angstmaschinen«) erschien 2015. 2019 wurde sein Roman »Qal« (»Die Erwähnung«), 2023 sein Kurzgeschichtenband »Siya yê din« (»Schatten des Anderen«) in der Türkei veröffentlicht. Er übersetzte verschiedene Autor:innen aus dem Deutschen und Englischen ins Kurdische, darunter Franz Kafka. Zuletzt wurde im März 2022 seine kurdische Übersetzung von Herta Müllers »Herztier« veröffentlicht. Er arbeitet aktuell als Psychiater und Psychotherapeut in Berlin.

Hesen Ildiz, di 1991an de li gundekî kurdan yê Tirkiyeyê ji dayîk bûye. Wî li Stenbol û Budapeştê bijîşkî xwendiyê. Berhevoka kurteçîrokên wî ya pêşîn di sala 2015an de bi navê »Tîrspîvan« derket. Di sala 2019an de romana wî ya bi navê »Qal«, di sala 2023an de jî berhevoka kurteçîrokan »Siya yê din« hatin weşandin. Wî gelek çîrok jî zimanên elmanî û îngilîzî wergerandine kurdî. D nav wan de Franz Kafka jî heye. Di vê dawiyê de wergera wî ya ji bo kurdî berhema Herta Müller »Herztier« (Bi kurdî dilajal) di adara 2022an de derket. Ew niha li Berlinê weke psikyatrîst û derûnnas dixebite.

Matthias Hoffmann



Matthias Hoffmann ist Diplompädagoge, Mediator und Erwachsenenbildner für Antidiskriminierung und Diversitätsorientierung. Ein Schwerpunkt ist die rassismuskritische (Selbst-)Reflexion in weißen Lerngruppen. Als Moderator und Prozessbegleiter begleitet er soziale Unternehmen bei Veränderungsprozessen. 2019 erschien sein Buch »Kurdistan von Anfang an«. Er ist Gründer des tîr-verlages (Verlag für kurdische Themen und Perspektiven) und Mitglied des Beirats der Kurdischen Gemeinde Deutschland (KGD).

Matthias Hoffmann weke perwerdekar, navberkar û perwerdekarê mirovên gihîştî di warên dij-cudakariyê û cihêrengî-şanîdaniyê de dixebite. Mijareke sereke ya ku Hoffmann li ser dixebite, xwe-rexneya nijadperestî di komên mirovên spî de ye. Ew weke moderator û navberkar di pevajoynê guherînê de piştgirîya pargîdaniyên civakî dike. Di sala 2019an de pirtûka wî ya bi navê »Kurdistan von Anfang an« bi kurdî »Ji Destpêkê Heya Niha Kurdistan« ji weşanxaneya Tîrê deket. Ew avakarê Tîr-Verlagê ye (Weşanxaneyek ji bo mijar û nêrînên derbarê kurdan) û ew herweha endamekî komîteya şewirmendiyê ya Civaka Kurd li Almanyayê ye.

● 19:30 Uhr

»Mayin, Sirgûn, Vegerîn: Kû der Welat e, Kû der Sirgûn e?« »Bleiben, Exil, Heimkehr: Wo ist Heimat und wo ist Exil?«

Moderatorin/Pêşkêşvan: Rojda Yaşîk

Sprache/Ziman: Kurdisch und Deutsch/Kurdî û Elmanî

Dolmetscher:innen/Wergêr: Sozdar Jafarzadeh und Flê Mereto

Ort/Cî: Großer Saal

Gulges Deryaspî



Gülgeş Deryaspi wurde 1978 in Bedlis geboren. Sie hat drei Romane geschrieben: »Tariya Bi Tav« (2010), »Xezal« (2013) und »Ez ne Ez im« (2019). Zwischen 2010 und 2016 war sie Direktorin von Kurdî-Der und unterrichtete Kurdisch. Von 2015 bis 2019 studierte sie kurdische Sprache und Literatur an der Muş Alparslan Universität. Im Jahr 2019 wurde sie verhaftet und für neun Monate inhaftiert. Nach ihrer Freilassung wurde sie zu 6 Jahren und 3 Monaten Haft verurteilt. Seit 2023 lebt sie in Deutschland.

Gulgeş Deryaspî di 1978an de li Bedlîsê ji dayik bûye. Wê heya niha sê roman nivîsandine: *Tariya Bi Tav* (Do; 2010), *Xezal* (J&J; 2013) û *Ez ne Ez im* (Sanci; 2019). Wê di navbera salên 2010 û 2016an de rêveberiya Kurdî-Derê û mamostetiya zimanê kurdî kir. Ji 2015an heya 2019an li Zanîngeha Muş Alparslanê ziman û wêjeye kurdî xwend. Sala 2019an de hate girtin û 9 mehan li zindanê ma. Piştî berdanê cardin ji wê re cezeya zindanê 6 sal û sê meh hate birîn. Ji 2023yan ve ew li Elmanyayê dijî.

Fatma Savci



Fatma Savcı wurde 1974 in Mardin, im Norden Kurdistans, geboren. Sie wurde zu 12 Jahren Gefängnis verurteilt, weil sie vor Gericht Kurdisch sprach. Nach ihrer Entlassung veröffentlichte sie Gedichte, Essays und Kurzgeschichten, drehte kulturelle und soziale Dokumentarfilme für kurdische Fernsehsender. Heute lebt sie in Schweden und arbeitet als Lehrerin für kurdische Sprache an einer Schule. Bisher hat sie neun Werke veröffentlicht.

Fatma Savci di sala 1974an de li bakurê Kurdistanê ji dayik bûye. Di dadgehê de bi kurdî peyivî û ji ber vê yekê 12 sal cezayê zindanê lê hat birîn. Piştî ku ew hat berdan, pirtûkên xwe yên helbest, nivîs û kurteçîrokên weşand. Savci, her wiha, ji bo televîzyonên kurdî xebitiye û belgefilmên çandî û civakî çêkirine. Fatma niha li Swêdê dijî û li dibistanekê mamosteya zimanê kurdî ye. Heta niha neh berhemên wê hatine weşandin.

Rojda Yaşîk



Rojda Yasîk wurde 1991 in Îdir, Nordkurdistan, geboren. Sie studierte Englisch an der Technischen Universität Yıldız in Istanbul. Sie hat Gedichte von Sylvia Plath, Anne Sexton, Maya Angelou und Elizabeth Bishop aus dem Englischen ins Kurdische übersetzt. Seit 2017 lebt sie in Berlin, wo sie als Übersetzerin und Schriftstellerin tätig ist.

Di sala 1991ê de li bajarê Îdirê yê bakurê Kurdistanê ji dayik bûye.

Li Îdirê lîseya mamostetiye û paşê li Stembolê li zanîngeha Yıldız Teknikê mamostetiya zimanê îngilîzî xwendiyê. Wê ji îngilîzî helbestên Sylvia Plathê, Anne Sextonê, Maya Angelouyê û Elizabeth Bishopê wergerandine kurdî. Her wiha, wê ji elmanî hemû helbestên Hilde Dominê wergerandine kurdî û ev werger niha ji bo çapê tê amadekirin. Yaşîk ji 2017an û vir ve li Berlinê dimîne û karê xwe yê wergêrî û nivîskariyê dike.

● 21:00 Uhr

»Vielsprachig – Lyrik im Exil und der Diaspora«

Moderatorin/Pêşkêşvan: Lara Sielmann

Sprache/Ziman: Kurdisch und Deutsch/Kurdî û Elmanî

Dolmetscher:innen/Wergêr: Sozdar Jafarzadeh und Flê Mereto

Ort/Cî: Großer Saal

Cana Bilir Meier



Cana Bilir-Meier studierte an der Akademie der bildenden Künste Wien sowie an der Sabancı-Universität in Istanbul. 2021 war sie Gastprofessorin für Kunstpädagogik an der Akademie der Bildenden Künste in München. Sie ist die Nichte von Semra Ertan und hat 2018 die Initiative zum Gedenken an die Dichterin, Arbeiterin und Aktivistin Semra Ertan mitbegründet und 2020 den Gedichtband »Semra Ertan. Mein Name ist Ausländer/Benim Adım Yabancı« bei edition assemblage mit herausgegeben.

Cana Bilir-Meierê li Akademiya Hunerên Ciwan a Wienê û her wiha li Stembolê li zanîngeha Sabancı xwendiyê. Di 2021ê de weke profesora mêvan ji bo perwerdehiya hunerê li zanîngeha Münchenê ya Perwerdeya Hunerên Ciwan xebitî. Ew xwarziya Semra Ertanê û yek ji damezirînerên destpêşxeriyê bîranîna helbestvan, karker û çalakvan Semra Ertanê ye. Di sala 2020an de wê pirtûka helbestan a bi navê *Mein Name ist Ausländer/Benim Adım Yabancı* (Navê Min Biyanî Ye) bi edition assemblage weşand.

Nail Dogan



Nail Dogan wurde 1988 in Augsburg geboren als Sohn eines Gasttaxifahrers und einer Gastputzfrau. Lebt in Hamburg. Kaut Fingernägel. Hält sich über Wasser. Schreibt.

Nail Dogan di 1988an de li Augsburgê ji dayîk bûye. Bavê wî tewsîajo û dayîka wî paqijker bû. Dogan li Hamburgê dijî. Neynûkên tiliyên xwe dicû. Xwe li ser avê digire. Dinivîse.

Meral Şimşek



Die Schriftstellerin und Dichterin Meral Şimşek kommt aus Amed. Sie ist Mitglied des Kurdischen PEN und PEN Berlin. Sie hat Gedichte, Romane und Kurzgeschichten geschrieben und arbeitete als Redakteurin für verschiedene Zeitschriften und Verlage. Şimşek wurde vielfach für ihre Gedichte ausgezeichnet. Aufgrund der Inhalte ihrer Bücher wurde sie von der türkischen Regierung angeklagt, die Staatsanwaltschaft fordert bis zu 30

Jahre Haft. Im Juli 2022 gelang PEN Berlin es, sie nach Deutschland zu bringen, wo sie nun im Exil lebt.

Helbestvan û nivîskar Meral Şimşek ji Amedê ye. Endama PENa Kurd û PENa Berlînê ye. Wê helbest û kurteçîrok nivîsandine û weke edîtor ji bo gelek rojname û weşanxaneyan xebitî ye. Şimşekê ji bo helbestên xwe heya niha gelek xelat wergirtine. Ji ber naveroka pirtûkên wê dewleta Tirkan cezayê zindanê heya 30 salan ji bo wê xwestiye. Di Tîrmeha sala 2022an de bi piştgiriya PEN Berlînê hatiye Elmanyayê.

Lara Sielmann



Lara Sielmann ist Kulturjournalistin und Literaturkritikerin. Als Redakteurin und Autorin arbeitet sie für den Deutschlandfunk Kultur und steht als Moderatorin von Lesungen und Podiumsdiskussionen auf der Bühne, sie kuratiert seit 2021 die Literaturreihe »Berliner Gegenwartsliteraturen« und doziert an der FU Berlin.

Lara Sielmann rojnamevan û rexnegira çandî ye. Ew ji bo Deutschlandfunk Kulturê weke nivîskar û edîtor dixebite, birêvebirin û moderatoriya xwendin û gotûbêjan dike. Ji sala 2021ê û vir ve ew kuratoriya »Wêjeyên Hevçerx li Berlînê« dike û li zanîngeha Azad weke akademîsyen dixebite.

● 22:30 Uhr

Konzert

Ort/Ci: Kaminzimmer

EBOW



EBOW veröffentlichte 2022 ihr viertes Album »Canê«.

Ebowa wandelt dabei bewusst zwischen Ambivalenzen und Widersprüchlichkeiten und hält diese offen aus. Flexen mit Prada-Taschen oder schnellen Autos einerseits und politischer Kampf, in dem gegen Homofeindlichkeit, Sexismus und Rassismus und für ein freies Kurdistan gerappt wird andererseits.

Der Sound pendelt zwischen wuchtigen Beats und emotionalem R&B Arrangements.

EBOWê albûma xwe ya çarem a bi navê *Canê* di 2022yan de belav kir. EBOW bi zanetî di navbera nediyanî û nakokiyan de diçe û tê û vê rewşê di xwe de dihebîne. Ji aliyekî ve tevî çenteyên Prada yan jî 'erebeyên lezgîn forsê davêje, ji aliyê din ve jî li hemberî homofobiyê, zayendperestiyê û nijadperestiyê, ji bo Kurdistanê azad rap dike. Deng di navbera ahengên xurt û rêzkinên hestiyar ên R&Byê de diçe û tê.

5 Fragen an EBOW

5 Pirs bi EBOW re

Beliban zu Stolberg (B): Wie würdest du beschreiben, was für Musik du machst?

EBOW (E): Sehr unterschiedlich, aber immer mit dem Fokus auf RnB und Rap und mit dem Bedürfnis, etwas zu schaffen, was es noch nicht gegeben hat.

B: Wer sind deine künstlerischen Vorbilder?

E: Ich habe keine eindeutigen künstlerischen Vorbilder mehr, es gibt aber einige Künstler:innen, die mich auf meinem Weg inspiriert haben. Darunter M.I.A. und Missy Elliott.

B: Welchen Einfluss hat die kurdische Kultur auf deine Musik?

E: Ich denke, über viele Einflüsse bin ich mir wahrscheinlich nicht mal bewusst, weil ich ja mit der Kultur aufgewachsen bin. Was mir persönlich über die Jahre hinweg wichtiger wurde, war es, die kurdische Sprache in meiner Arbeit in den Songs sowie den Live Performances oder Grafiken einzubauen.

B: Welche Verbindungen zwischen Rap und Literatur siehst du?

E: Ich denke, von allen Genres, die es gibt, ist Rap der Literatur am nächsten. Sei es durch die verschiedenen Arten im Rap – Storytelling zum Beispiel – oder auch dadurch, dass die Sprache im Rap sehr direkt ist.

B: Was ist deine Assoziation zum Titel des Festivals: »Dengê min tê te? – Hörst du mich?«

E: Ich mag den Titel. Er assoziiert ein ständiges Überhört werden oder auch, dass hingehört, aber nicht zugehört wird. Gleichzeitig ist es für mich auch eine Aufforderung an die Zuhörer:innen, wachsam zu sein.

Beliban zu Stolberg (B): Gelo tu cureyê muzîka ku tu çêdikî, çawa pêname dikî?

EBOW (E): Gelekî cuda ye, lê belê hertim bala xwe didime RnByê û rapê. Di heman demê de pêwîstiya min bi afirandina tiştêkî nû ya ku hê tune ye, heye.

B: Mînakên te yên hunerî kî ne??

E: Êdî ti mînakên min ên hunerî yên zelal tune ne, lê çend hunermend hene ku di rîya min a hunerî de îlham dane min. Du ji wan hunermendan M.I.A. û Missy Elliott in.

B: Bandoreke çawa ya çanda kurdî li ser muzîka te heye?

E: Ez bawer dikim ku hayê min ji gelek bandoran tune bû, ji ber ku ez bi çanda kurdî re mezin bûm. Tiştê ku ji bo min bi salan re girîngtir dibû, ew bû ku zimanê kurdî di nav xebatên min ên li ser stranan de û hem jî di performansên zindî an jî grafîkan de cih bigire.

B: Tu di navbera rapê û wêjeyê de kîjan peywendiyên dibînî?

E: Di bawerîya min ji hemû cureyên ku hene, rap a herî nêzîkî wêjeyê ye. Dibe ku ji ber cureyên cuda yên rapê, bo nimûne çîrokbêjî, yan jî ji ber ku ziman di rapê de gelekî rasterast e.

B: Serenavê festîvalê »Dengê min tê te? – Hörst du mich?« çî tîne bîra te?

E: Kêfa min ji vî sernavî re hat. Ew paşguhkirineke domdar an bihîstineke bê guhdarîkirinê tîne bîra min. Di heman demê de ji bo min jî daxwazek e ji guhdaran re ku hişyar bimînin.

Samstag Şemî

Suche nach der Heimat: Das generationenübergreifende Exil/ Gera li Malê: Sirgûniya Navnifşî

● 12:00 Uhr

Ferhat Keskin
»Rovî û Pîrê«
»Der Fuchs und die alte Dame«

**Interaktive Märchenerzählung mit Ferhat Keskin/
Vegotina înteraktîv bi Ferhat Keskin re**

Sprache/Ziman: Kurdisch und Deutsch/Kurdî û Elmanî
Ort/Cî: Kaminzimmer

Ferhat Keskin



Ferhat Keskin wurde 1967 in Bingöl/Türkei geboren. 1981 emigrierte er nach Deutschland. Nach der Ausbildung und Arbeit als Straßenbauer arbeitete er von 1989 bis 1991 als Schauspieler in der freien Szene. Von 1992 bis 2006 war er Ensemblemitglied am Theater an der Ruhr. Seit 2006 ist er als freischaffender Schauspieler an verschiedenen Theatern und in diversen Fernseh- und Kinofilmen zu sehen, außerdem ist er als Theaterregisseur tätig.

Ferhat Keskin di sala 1967an de li Çewlîgê ji dayîk bûye û di sala 1981ê de koçî Elmanyayê kiriye. Piştî perwerdeya însa'eta rîyan û karê însa'etê salên di navbera 1989an û 1991ê de, wekî endamê komeke serbixwe bi şanoyê rabû. Ji sala 1992an heta bi sala 2006an endamê koma şanoyê *Theater an der Ruhr* bû. Ji sala 2006an û vir ve, wekî şanogerekî serbixwe, di gelek projeyên şanoyê û televîzyonê de beşdar e û her wiha derhêneriya şanoyê dike.

● 14:00 Uhr

»Kurdî li Almanyayê: Diyalogeke Rexneyî li ser Ziman, Perwerdehî û Zayendê «Kurdisch in Deutschland: Ein kritischer Dialog über Sprache, Bildung und Geschlecht«

Moderator/Pêşkêşvan: Adnan Çelik

Sprache/Ziman: Kurdîsch und Deutsch/Kurdî û Elmanî

Dolmetscher:innen/Wergêr: Sozdar Jafarzadeh und Flê Mereto

Ort/Ci: Großer Saal

Şerif Derince



Şerif Derince promoviert an der Universität Potsdam im Bereich der angewandten Linguistik. Dabei erforscht er die Praktiken und Wahrnehmungen in Bezug auf den Unterricht von Kurdîsch als Herkunftssprache in Deutschland. Weitere Forschungs- und Praxisschwerpunkte umfassen Bereiche wie Lehrerausbildung, Lehrplan- und Materialentwicklung. Er arbeitet auch für den Yekmal e.V. als Koordinator der Yekmal Akademie.

Şerif Derince doktoraya xwe li Zankoya Potsdamê di Beşa Zanistên Tetbîqî de û di warê zimannasiyê de dike. Li vê derê wî li sepanên û têgihîştinên der barê dersên Kurdî de wekî zimanê zikmakî li Elmanyayê kolan. Lêkolanên wî yên din di derheqê xalên lêkolîn û tetbîqkirinê yên di warê perwerdeya mamosteyan, bernameyên perwerdeyê û pêşvebirina materyalên perwerdeyê de ne. Ew her wiha weke birêveberê Akademiya Yekmalê, Komeleya Malbatên ji Kurdistanê yên li Elmanyayê dixebite.

Münevver Azizoğlu-Bazan



Münevver Azizoğlu-Bazan promovierte im Bereich Erziehungswissenschaft im Fachbereich Interkulturelle Bildung an der Universität Bremen. Derzeit ist sie Dozentin am Institut für Ethnologie und Kulturwissenschaften der Universität Bremen und Dozentin für Gender Studies an der Universität Rojava. Außerdem unterrichtet sie Kurdîsch am Fremdsprachenzentrum der Universität Bremen.

Munewver Azizoglu-Bazan doktoraya xwe li Zankoya Bremenê di beşê zanistên perwerdeyê, warê perwerdeya navkeltorî de kir. Niha Bazan li Zankoya Bremenê, Enstîtuya Etnolojiyê û Zanistên Çandî (IfEK) de akademîsyen e. Her wiha, bi xwe li Zankoya Rojava di Beşê Zanistên Civakî de di warê Xebatên Zayendê de akademîsyen e. Her wiha li Zankoya Bremenê di navenda zimanên biyanî de dersên Kurdî dide.

Adnan Çelik



Adnan Çelik ist Anthropologe und Historiker mit einem Dokortitel in Sozialanthropologie der EHESS in Paris. Derzeit ist er Postdoktorand am Institut für Europäische Ethnologie der Humboldt-Universität zu Berlin. Er ist u.a. Autor von »Dans l'ombre de l'état: Kurdes contre Kurdes« (2021), Mitautor von »Laboratories of Learning: Social Movements, Learning and Knowledge-Making in the Global South« (2024).

Adnan Çelik antropolog û dîrokzanê xwedî dereceya doktorayê ye ku di beşê antropolojiya civakî ya li EHESS, Parîsê de xwendiyê. Niha wekî lêkolînerê pişt-doktorayê li Berlînê di Zankoya Humboldtê, beşê Etnolojiya Ewrûpî de dixebite. Di gel gelek kar û xebatên din, ew nivîskarê berhema bi navê *Dans l'ombre de l'état: Kurdes contre Kurdes* (Li Ber Siya Dewletê: Kurd Li Dijî Kurdan, Brepols, 2021) e. Her wiha, Çelik hevnivîskarê *Laboratories of Learning: Social Movements, Learning and Knowledge-Making in the Global South* (Laboratiwarên Fêrbûnê: Bizavên Civakî, Fêrbûn û Berhemanîna Zanyariyê Li Başûrê Global, Pluto Press, 2024) e.

● **15:30 Uhr**

»**Çîrokeke Sirgûniyê ya Navnifî: Li ser Jîyan û Berhemên wî Axaftinek bi Eskerê Boyik re**«

»**Eine generationenübergreifende Geschichte des Exils: Gespräch mit Eskerê Boyik über sein Werk und Leben**«

Moderator/Pêşkêşvan: Davut Yeşilmen

Sprache/Ziman: Kurdisch und Deutsch/Kurdî û Elmanî

Dolmetscher:innen/Wergêr: Sozdar Jafarzadeh und Flê Mereto

Ort/Ci: Großer Saal

Eskerê Boyik



Eskerê Boyik wurde 1941 in einer ezidisch-kurdischen Familie im Bezirk Ahbaran in der Republik Armenien geboren. 1974 erhielt er seinen Dokortitel in Wirtschaftswissenschaften an der Universität für Wirtschaft und war bis 1993 Leiter des Fachbereichs an derselben Universität. Eskerê Boyik ist Autor zahlreicher Werke in den Bereichen Lyrik, Kurzgeschichten, Romane, Literaturkritik, Geschichte und Ezid:innen. Eskerê Boyik ist seit

1984 Mitglied des sowjetischen Schriftstellerverbands, Mitglied des Schriftstellerverbands der Republik Armenien und Kasachstans und Mitglied des kurdischen PEN.

Eskerê Boyik weke zarokê malbateke kurd-êzîdî di sala 1941ê de li Axbarana Komara Ermenistanê ji dayîk bûye. Sala 1974an, wî doktoraya xwe di Zankoya Îktîsadiyê de, di beşê Îktîsadiyê de xweyî kiriye û heta sala 1993yan ew beş bi rê ve biriye. Eskerê Boyik nivîskarê gelek helbest, kurteçîrok, roman, rexneyên edebiyatê û dîroka êzdiyan e. Ji 1984an û vir ve endamê Yekîtiya Nivîskarên Sovyêtê, endamê Yekîtiya Nivîskarên Komara Ermenistanê û Qazaxistanê û endamê PENa Kurd e.

Davut Yeşilmen



Davut Yeşilmen wurde 1984 in Mêrdîn geboren. Er studierte Pädagogik in der Türkei und absolvierte neben seiner Tätigkeit als Lehrer ein Masterstudium an der Mardin Artuklu Universität. 2016 zog er nach Deutschland. Er promovierte an der Universität Duisburg-Essen zum Thema »Die Darstellung des Genozids von 1915 in der kurdischen Belletristik nach 2000«. Parallel zu seiner Promotion arbeitete er als wissenschaftlicher Mitarbeiter an der Universität und war von 2014 bis 2021 Redakteur der kurdischen Zeitschrift »Wêje û Rexne« (Literatur und Kritik), die in Diyarbakir erscheint.

Davut Yeşilmen di sala 1984an de li Mêrdînê ji dayîk bûye. Perwerdeya pedagojîyê girt û di gel karê mamostayîyê li Zankoya Mardin Artukluyê li ser mijara »sirgûnî di romanên Kurdî de« mastera xwe temam kir. Sala 2016an, wî koçî Elmanyayê kir. Wî doktoraya xwe li Zankoya Duisburg Essenê li ser mijara »Pêşkêşkirina Komkujiya 1915an di Çiroksaziya Piştî 2000î ya Kurdî de« kir. Li gel doktorayê li heman zankoyê wekî lêkolîner xebitî. Ji bilî karê akademîk, ew ji 2014an heta 2021ê edîtorê kovara Wêje û Rexne ya li Amedê bû.

● 17:00 Uhr

